


Vakslêdana li dijî COVID-19



06 Nîsan 2021



Çima divê ez bê m vaxslêdan?

COVID-19 ji vîruseke nû çêdibe ku mirovan enfekte dike. Ji ber vê yekê, em ne şêbexşî enfeksiyonê ne, lewma COVID-19 karî mîna pandemiyê belav bibe.

Tenê di beşek piçûk a nifûsa Danîmarkî de COVID-19 çêbû, û em bi guman nizanin ka kesên ku enfekte bûne bi tevahî paşê ji nû ve ji enfektebûnê têne parastin.

Her kes dikare bi COVID-19 ve enfekte bibe. Û her kes dikare ji COVID-19 nexweş bibe. Lê belê, hin kes bi taybetî riska wan heye ku bi nexweşiyên giran bikevin û bimirin eger enfeksiyonê bigirin.



Daîreya Tenduristiyê ya Danîmarkî pêşniyara vaxslêdanê ya li hember COVID-19 dike ji ber ku ew we li hemberî enfektebûn û nexweşbûna bi COVID-19 diparêze.

Hindî ku zêde mirov bê m vaxslêdan, em ê çêtir bikaribin epidemiyê kontrol bikin.

Vaxslêdan bê pere ye, û bi timamî bi dilxwazî ye ku hûn ê pêşniyara vaxslêdanê qebûl bikin an na.

Vaxslêdan dê ji min re bê pêşkêşkirin?

Li Danîmarkayê ji her kes re li dijî COVID-19 vaxslêdan tê pêşkêşkirin, welatîyên ne-Danîmarkî jî di nav de. Girîng e ku hindî ku pêkan be gelek kes bê m vaxslêdan da ku em bikaribin epidemiyê kontrol bikin. Lê belê, em bi giştî vaxslêdanê pêşkêşî zarokên kê mî 16 salî yan jî jinên ducanî an jî şîr didin nakin ji ber ku vaxsîn li ser wan koman nehatiye ceribandî û nehatiye erêkirin.

Salnameya vaxslêdanê ya Daîreya Tenduristiyê ya Danîmarkayê dê bi berdewamî were nûkirin da ku hûn karibin bişopînin ka kengê dora we ye li ser: www.sst.dk/vaccinationskalender



Der barê vakslêdanê de ez ê çawa bê m agahdarkirin?

Dema dor a we be hûn ê bi rêya e-Boksê werin agahdarkirin û hûn dikarin cihveqetandina vakslêdanê bikin li ser www.vacciner.dk. Eger hûn ji wergirtina Digital Post re bêpar in, hûn ê nameyek ji postê bistînin û hûn dikarin bi telefonê randevûyê çêbikin.



Gava hûn dikarin randevûyekê cihveqetînin, dibe ku ji bo we zehmet be ku hûn demên heyî peyde bikin. Heke wisa be, ji kerema xwe paşê dîsa biceribînin, ji ber ku demên nû bi berdewamî li pergalê têne zêdekirin.

Eger hûn pêşniyara vakslêdana derziyê tavlê qebûl nakin, hûn ê firsenda vaxsînêdanê ya bê pere piştre ji dest bernedin. Lêbelê, Daîreya Tendurustiyê ya Danîmarkê pêşniyar dike ku hûn pêşniyarê di demek zû de bistînin, ji ber ku girîng e ku bi qasî ku gelek kes zû bi zû bêne vakslêdan da ku em bikarin epîdemiyê di bin kontrolê de bigirin.

Vakslêdan çawa pêk tê?



1. Di dema diyarkirî de li navenda vakslêdanê xwe nîşan bidin. Maskeyeke rû û karta xwe ya sîgorta tenduristiyê ya zer bînin.



2. Pişporên xizmeta tenduristiyê yên cuda dikarin vaxsînê bidin, lê ew ê her tim di bin berpirsiyariya bijîşk de kar bikin.



3. Wek rêwerz, dê vakslêdan li masûlkeya sermilê te yê sereke were xistin.



4. Piştî ku hûn hatin vakslêdan kêmtirîn 15 deqeyan li bendê bimînin ku pişporên tenduristiyê eger reaksiyona we ya alerjîk hebe bikarin alîkariya we bikin.

Ez bi taybetî hay ji çi hebim?



1. Em vaxslêdanên COVID-19 pêşniyar nakin ji bo zarokên kêmi 16 salî û jinên ducanî û zarokan şîr didin ji ber ku vaxslêdan ji bo van koman hê bi têkerî nehatine ceribandin. Eger ihtîmal hebe ku hûn ducanî bin, berî ku vaxslêdan bê kirin bi doktor re bipeyivin. Di rewşên awarte de, ji bo nimûne eger zarokek an jinek ducanî xwedî nexweşiyêke giran be, dibe ku vaxslêdanek li ser bingeha nirxandina tibî ya takekesî were pêşkêşkirin.



2. Eger we reaksiyona alerjîk a giran (anafilaksi) li ser yek an jî çend ji pêkhatên çalak ên vaxsînan, wek makrogol an PEG, hebe an jî eger we reaksiyona anafilaktîk piştî doza yekem nîşan dabe, hîngê divê hûn neyên vaxslêdan.



3. Eger we pir kêmi plateletan an nexweşiyek wekî hamofiliya hebe, hûn dikarin di xetereya herî bilind a berhevkirina xwînê de bin eger hûn bîn vaxslêdan. Ji ber vê yekê, berî ku hûn bîn vaxslêdan, bi doktor re biaxivin.

Kengî divê ez vaxslêdanê li paş bixim?



1. Eger tayeke we ya bilind (herî kêmi 38 derece) hebe an jî enfeksiyoneke giran a akut a wekî pnêumonia hebe, divê vaxslêdana we were paşxistin. Dibe ku hûn vaxslêdan bibin eger we tenê tayeke piçûk an enfeksiyonên wekî serma hevbeş a ne giran hebe. Lê hûn divê her dem li ber çav bigirin ku dibe bi we re COVID-19 hebe.



2. Eger COVID-19 bi we re hebe, divê hûn vaxslêdanê paşve bixin.



3. Eger hûn hatibin testkirin ji ber gumanbariya COVID-19 an jî ji ber ku bi kesekî ku COVID-19 pê re heye têtîliya we çêbûye, divê hûn vaxslêdanê paşve bixin heta ku encama testê bistinin. Eger testa we neyîni be, hûn dikarin vaxslêdan bibin, lê eger erênî be, tê pêşniyarkirin ku hûn herî kêmi mehekê bisekinin piştî ku hûn êdî xwe nexweş his nekin.



Bandorên kêlekê yên gengaz çi ne?

Hemû vaxslêdan xwedî bandorên kêlekê ne, lê her kesê ku vaxslêdan dibe bandorên kêlekê çênake. Bi giştî, ev bandorên kêlekê nerm û demkî ne, û em vaxsîna COVID-19 wek vaxsînê pir bi ewle û pir belgekirî dibînin. Bandorên herî gelemperî yên ku mirov dibe ku dema bi yek ji vaxslêdanên COVID-19 ve têne vaxslêdan bibîne li jêr têne listekirin.

Mînakên bandorên kêlekê yên hevpar	
Bertekên herêmî	Bertekên giştî
<ul style="list-style-type: none">Êş û sorbûna li cihê derziyê	<ul style="list-style-type: none">WestandinSerêşÊşa masûlke û movikêCemidînZêdebûna kêma a germahiyê
Mînakên bandorên kêlekê yên kêmdîtî	
<ul style="list-style-type: none">Bertekên tund ên alerjiyêZehmetiya bêhnhildanêSorbûna çermWerma rûyê	



Pir kes dê di cihê derziyê de êşê bibînin. Gelek kes dê reaksiyonên giştî yên wek êşa masûlkeyan an jî tayeke biçûk bibînin, ku bi gelemperî nîşan didin ku sîstema parastina laşê we wekî ku divê bertekê nîşanî vaxsînê dide. Eger hûn wan bandorên naskirî û derbasdar bibînin ne hewce ye ku hûn bi doktorê xwe re telefon bikin.

Di kêma rewşan de, dibe ku hûn piştî vaxslêdana xwe tavilê reaksiyona alerjîk a giran bibînin. Eger alerjiya we ya giran a dermanê hebe, wek mînak, beriya ku hûn bîna vaxslêdanê divê haya we ji vê hebe. Personalên hawarçûnê wê her tim li navendên vaxslêdanê yên COVID-19 li ber dest bin da ku reaksiyonên tund ên alerjîk çareser bikin.

Di navbera zêde xuyabûna kîjan bandorên kêlekê û reaksiyonan û cureyê vaxsînê cudahiyeke biçûk heye. Bêtir bixwînin li www.sst.dk/covid-vaccination

Ez dikarim kîjan vaksînan bistînim?

Yek ji vaksînên COVID-19 ên ji bo bikaranîna li Danîmarkayê hatine erêkirin dê pêşkêşî we were kirin.

	Comirnaty®	COVID-19 Vaksîna Moderna®
Cure	Vaksîna RNA	Vaksîna RNA
Hatiye pêşxistin ji hêla	Şirketa BioNTech a Alman bi hevkarîya şirketa Pfizer a DY	Şirketa Amerîkî Moderna
Hatiye hilberandin li	Almanya û Belçîkayê	Îspanya û Swîsrê
Hatiye pejirandin ji bo	Kesên 16 + – ji bilî jinên ducanî û şîrê dayîkê didin	Kesên 18 + – ji bilî jinên ducanî û şîrê dayîkê didin
Hejmara dozên ji bo bandora tam	2	2
Pardema navbera vaxslêdanan	3-6 hefte	4-6 hefte
Tam tesîra ku bi dest ve hat	7 roj piştî derziya duyemîn	14 roj piştî derziya duyemîn



Ez dikarim kîjan vaksîna ku dixwazim hilbijêrim?


Ji ber ku em tenê miqdarên vaksînê yê sîncard digirin, û ji ber ku pêdivî ye ku vaksîn di bin şert û mercên pir taybet de bî hilandin û girtin, divê em belavkirina vaksînan di bin kontrola hişk de bihêlin. Her dozek tê hejmartin, û em naxwazin tu vaksînê berze bikin, ji ber vê yekê hûn nikarin kîjan vaksînê hilbijêrin ku dê ji we re bê dayîn. Heman tişt ji bo bernameya vaxslêdanê ya zarokatiyê û bernameyên din ên vaxslêdanê yê belaş ên li Danîmarkayê jî derbas dibe. Ji bo niha, hemû vaksînên COVID-19 ên radestî Danîmarkayê hatin kirin dê di bin pêşniyara vaxslêdana belaş de bî belavkirin, û ji ber vê yekê ne pêkan e ku vaksîn li ser reçeteyê bê kirin.

Vaksîn çawa dixebitin?


Her vaksînên COVID-19 ên ku hatine pejirandin zincîrên biçûk ên koda genetîkî ya ji asîdên nûkleîk (RNA an DNA) hatine çêkirin digirin nav xwe, ku bi awayekî xwezayî di laşê mirovan de peyde dibin. Di vaksînên Comirnaty® û COVID-19 Vaksîna Moderna®, strên kodê di nav rûnê de hatine nixandin.

Dema ku zincîrên koda genetîkî dikevin hucreyên bedenê, kod bi proteînê tê wergerandin ku taybetiyeke koronavîrusa nû ye. Ew proteîn sîstema jêbexşiyê ya laş han dide da ku antîkorên parêzger û hucreyên parastina taybet çêbikin da ku pergala parêzvaniyê vîrusê nas bike û wê bişikîne eger hûn li heyameke din enfeksiyonê bistînin.


Zincîra kodê û madeyên navberê yê vaksînê piştî ku erka xwe pêk anîn ji aliyê laş ve bi lez tên şikandin.




1. Di vaksînê de kodên zincîrên biçûk hene.



2. Enkapsulasyon dibe alîkar ku zincîra kodê di hundirê hucreyên laş re bîne. Enkapsulasyon piştê bi enzîmên bedenê bi lez û bez tê şikandin.



3. Zincîrên biçûk ên kodê dibe sedem ku hucre proteînên nû hilberîne, ku li derveyê hucreyê bi cih dibin û sîstema jêbexşiya bedenê hişyar dikin ji bo avakirina antîbodî û hucreyên jêbexşiyê biafirîne.



4. Antîkor û hucreyên jêbexşiyê dikarin vîrusê biqelîşînin eger hûn di mêjûyeke din de bi vîrusê bikevin. Dema ku karê xwe bi dawî kir di hucreyê de zincîra kodê tê şikandin.

Vaksîn çiqas bi bandor in?

Vaksînen COVID-19 hemî di ceribandînen berbiçav ên berfireh de hatine xebitandin, ku ji komekê re vaksîn hatiye dayîn û ji komeke din re jî derziya saline an jî vaksîneke din (bi navê placebo) hate dayîn. Bandoriya vaksînan bi berhevdana ku di her du koman de çend kes bi COVID-19 re nexweş bûne hatiye hesab kirin.

Bi gelemperî, gelek kêmtir kesên ku hatine vaxslêdan paşê bi COVID-19 nexweş ketin. Karîgerîya vaksîne bi diyarkirina kêmbûna rîska nexweşiyê ji bo kesên vaxslêkirî li gorî koma placebo tê hesab kirin. Eger, ji bo nimûne, di komekê de 100 kes û di koma din de 5-6 kes nexweş bibin, wê demê bandorî dê 94-95% be, ku ev rewş ji bo Comirnaty® û COVID-19 Vaksîna Moderna® ye.

Ji aliyê din ve, ev nayê wateya ku hûn 'tenê', ji bo nimûne, bi rejeya 95% tîn parastin, û nayê wateya ku rîska ku hûn COVID-19 bigirin, ji bo nimûne, bi rejeya 5% e, her çiqas hûn hatibin vaxslêdan jî. Di rastiyê de, rîsk pir kêmtir e, ji ber ku hûn jî divê li ber çavan bigirin ku rîska ku COVID-19 bistînin kêmtir e bê ka hûn hatine vaxslêdan an na. Rêjeya enfeksiyonê (rûdan) ya 100, wek mînak, tê wê wateyê ku di nava 24 saetên dawî de 100 kes ji her 100,000 nişteciyan erênî test kirine. Eger em texmîn bikin ku nivê wan jî nişaneyên wan hene, an ku bi COVID-19 re nexweş bûne, hingê bandoriya vaksînan – eger her kes were vaxsînkirin – tê wê wateyê ku tenê 3-4 ji kesên efektebûyî bi COVID-19 re nexweş bibin, ji hêla din ve jî 50 kes dê nexweş bin eger çî kes nehatibin vaxslêdan.

Çima du caran pêdivî bi vakslêdana min heye?

Vaksîn heta 1-2 hefteyan piştî derziya duyemîn bi temamî bi bandor nabe, û ji ber vê yekê divê du caran derzî li we bê xistin.

Em hîn nizanin ka vaksîn heta kengî parastinê dide. Ji ber vê yekê, em nikarin bêjin gelo parastin dê gelek salan bimîne, an dibe ku hûn di demeke şûn de ji nû ve vakslêdan bibin da ku hûn parastî bimînin an na.

Piştî ku min vakslêdan kir divê ez hay ji çi bim?

Tevî ku vakslêdana we hatiye kirin jî, divê hûn hîn jî rêberiya giştî ya Rêveberiya Tenduristiyê ya Danîmarkayê bişopînin ku çawa pêşî li enfeksiyonê bê girtin. Vaksîn %100 bi bandor nîne, û em hîn nizanin ka vakslêdan di heman demê de we asteng dike ku hûn vîrusê hilgirin û kesên din enfekte bikin.

Divê hûn bi doktorê xwe re têkilî çêbikin eger hûn semptomên giran nîşan bidin piştî ku hûn hatin vakslêdan. Ev dibe ku, ji bo nimûne, nîşanên alerjîk ên wekî tengasiya nefesê an jî reşbûna çerm be. Doktor dikare binirxîne ka semptom ji ber vaksînê an jî ji ber faktorên din pêk tên, û eger hewce be tedawî dest pê bikin.

Doktorê we mecbûr e ku bandorên kêlekê yê gumanbar ji Ajansa Dermanên Danîmarkayê re ragihîne. Her weha dibe ku hûn bi xwe jî bandorên kêlekê yê gumanbar ji Ajansa Dermanên Danîmarkayê re rapor bikin bi rêya www.lmst.dk

Hûn dikarin li ku derê bersiva pirsên xwe bibînin?

Hûn dikarin her dem agahdariya herî dawî li ser vakslêdana li dijî COVID-19 li www.sst.dk/covid-vaccination bibînin û bêtir bixwînin li ser koronavîrîsa nû û COVID-19 li www.sst.dk/corona